



# HĒVi

Kovara Kurdi ya zarokan

Hejmar 9 Cotmeh 1981







## TÈXISTİNÎ

Şıvan û Mar.....	2
Elfabâ Hejmaran.....	7
Listika Qafikan.....	7
Çekirin zor e lê xırakırin hêsa ye.....	11
Elik, Fatik û Manga Belek.....	14
Gelo hûn van tiştan dinasin....	16

## Şıvan û Mar

Rojekê şıvanek dî nav daristanê re 'derbas dîbû,ku here mal.Lî ser riya xwe dit, ku lî rex rê agîr bî deviyakê ketiye û dişewite Hew dit ku dengek ji deviyê tê,dîbê;

"Şıvano, şıvano ez ketime bextê te,min ji vir xelaske."

Şıvan lê sekini,dit ku mareke.Jê ra got;  
"Tu mar i,ez newêrim te xelaskim."

Mar lê vegerand û got;

"Ger tu min xelaskî,ez ê ji rojekê bî kîri te bêm."

Şıvan lî ser van gotin û lavayêñ mar dax waza wi qebûl kîr.Pêre rabû,tûrê xwe bî serê darê(çoyê) xwe ve kîr û dîrêji mîr kîr. Dema tûr gîhişt ba mîr,mar xwe berdayê û şıvan wi ji ser deviyê ani xwar.

Gava şıvan devê tûr vekîr,mar dî ci de xwe ji tûr kîsand û lî dora stuyê wi piçikand.Şıvan dî ci de mat ma ku çîmamar ev bêbex tîya pê re kîr.Lê dî demek kîn de,ev tertî landîna wi derbas bû û fîtili ser mîr jê pîrisi:

"Ma xêr e birakê mar,tu dîki çî bîki?"

Mar lê vegerand û got:

"Ez mar im,ne bıratıya mın heye,ne ji  
dostıtiya mın.Nıha ezê bı te vedim û te biku  
jım."



Pey vê axaftina mar re,tırsa şivan hin ji zêdetir bû.Lê tırsê pere nedikir,pêwist bû,ji xwe re rêkê bibine û xwe ji destê mar xelas ke.Demekê fıkırı,gelo çi bike.Rabû ji mar re got:

"Bırakê mar,ma ne tu dî deviyê de dikira bışewitiya,mîn te xelaskır.Nîha ji tu yê çawa rabi vê bêbextiya han bî mîn re biki.Ger mîn te ji deviyê xelas nekîra,nîha tê dî wir de şewiti bûna,ma ev ji heqê mîn e?"

Lê mar carekê bîryara xwe dabû,ku wê pê vede.Jî ber vê yekê ji,tu peyv berbi serê wi ve nedîçû.Mar li şivan vegerand û got;

"Ez fam nakîm,mîn carekê gotiye ku ezê bî te vedim.Gere ez,maritiya xwe bîpeytinim (ispat bikim)."

Şivan baş tê gîhişt ku,mar wê rast pê vede,lî ber gerandin wi xelas nake.Duv re got;

"E baş e,hey ku te bîryara xwe daye, tu yê bî mîn vedi,ka em herin ba qadiyeki bîra ifada me herduyan bigre,gelo em ki neheqin û paşê bî mîn vede."

Mîr got;

"Ka emê herin ba kê?"

Şivan;

"Hema ki berê lî me qelibî emê ji wi sewal bikin."

Mar vê pêşniyara şivan qebûl kîr û bî rê ketin.Pîr çûn hindik çûn lî rûviyaki rast hatin.Rabûn serpêhatiya xwe ji seri heta da-wiyê ji rûvi re gotin.Rûvi hîneki ramiya û got:



"Baş e, lê dibê ku, ez bûyerê ji seri de  
di ci de bibinim, gelo hela ka çawa bûye. Heta  
ku ez bûyerê di ci de bi çavê xwe nebînim, ez  
nîkarîm tu bîryarekê bîdim."

Herduyan ji vê peyvê di cih de ditin û  
dane rê çûn şûna xwe ya berê.

Rûvi:

"Ka berê bûyer çawa bûbû, niha ji li ber  
çavên min cardin wisa bikin, ku ez bibinim."

Mar rabû hîlkîşıya ser deviyê. Pêre ar be  
ra deviyê dan û mîr bang kîr got;

"Şîvano min xelaske. Şîvan rabû tûrê xwe  
bi serê darê xwe ve kîr û dîrêji mîr kîr. Mar  
xwe berda tûr, şîvan tûr ani dani erdê. Lî be  
ri ku şîvan devê tûr veke, Rûvi bang kîr got;

"Ho şîvano ma ew çiye di tûr de?"

Şîvan got;

"Mar e."

Rûvi got;

"Ew çiye di destê te de?"

Şîvan got:

"Ev ji dar e."

Rûvi got;

"De lêxe bikuje, ma ne neyar e."

Dema rûvi weni got, şîvan darê destê xwe  
hilani û bera ser fetla mîr da. Yek, dudu, sisê  
mar temam kîr û berda. Piştre rûvi vegeriya  
ser şîvan û jê re got;

"Birakê şîvan, bîra tu baş zanibi, tu cari  
neyar ji merivan re nabe yar."

## Elfaba Hejmaran


Geli hevalên jir!

Me di Hêvi hejmara şesa de bî giryazan  
heta deha jîmartıbû û nîvisandıbû. Em fîrbûna  
xwendîn û nîvisandına jîmaran didominin. Ka i  
car em jî yazda heta bistî disa bî giryazan  
bîjmîrin û binivisin;


11  
yazde



12  
duwazde



13  
sêzde




14  
çarde



15  
pazde




16  
şazde




17  
hîvde




18  
hijde



19  
nozde



20  
bist



## LİSTİKA QAFIKAN

Listika qafikan lî der tê listin. Zarok  
dîbin du ber. Hindiktîrin her berek dîvê jî  
du kesan këmtîr nebe. Jî bo dagê "Şili û Ziwa  
yi" tinin. Tîf dikin ser kevireki hûr û pan û


kevir davêjin hewa.Aliyê tifê şili û aliyê  
dîn ji ziwayi ye.Çaxa kevir dikeve erdê, ki-  
jan ali be,ew bera ku wê xwestibû qezenç dî-  
ke û dest bi listikê dikin.

Bera ku dibe diya dagê,yek ji wan heft  
kevirên piçûk yê pan dide ser hev û qûçê çê  
dike.Lî pêsiya qûça qafikan lingêñ xwe cot  
dike û pêsiya aliyêñ xwe ji hev dike û herdû  
paniyêñ xwe dide ber hev.Hemû hevalên wi ji  
ji wi dûr lî der û dora wi bela dibin.

Komika himber ji qasi deh gavan dûrê qû-  
ça qafikan xêzeki dikşinin û hemû lî dûv hev  
dikevin dorê.Dî destê kesê pêsin de gogeki he-  
ye.Ew heta kare gogê bi pit û bi hêz lî qûça  
qafikan dixe û xira dike.Gava ku qafik xira  
dibin,gog ji bi hêz dûr ve dere.Ew kesê, ku  
lî ber qûça qafikan diyadagê ye,lez dike,qa-  
fikêñ ku ji ser hev dikevin,dide ser hev.He-  
valên wi ji,ji dûrve jê re gogê digrin û ta-  
vêjin wi.Bera ku qafikan dixe ew ji bazdidin  
heta ciyê qafikan û paşve direvin şuna xêzi-  
ka xwe.Ger diyadagê dereng qafikan bide ser  
hev,ewen ku qafikan dixin ben ciyên qafikan  
û paşde herin şuna xêzika xwe,wê çaxê ew lis-  
tikê qezenç dikin û ji serive gogê davêjin  
qafikan.Na,ger diyadagê zû qafikan bide ser  
hev û hevalên wi ji,zû gogê bavêjin wi û ew  
ji gogê bi ewen himber xwe ve de,wê çaxê ali  
ye diyadagê listikê qezenç dike.Bes diyadagê  
kare gogê bi yêñ dîj xwe ve de.Hevalên wi ni-  
karin.Ew bi tenê jê re gogê davêjin.Koma him-  
ber dikeve ber qafikan.Ci tê guhartin.

Car heye,ku ew kesêñ,ku gogê davêjin qû-

ça qafikan,nikarin lî qûçê xin.Dibe ku gog  
lî valayî dûr here.Wê çaxêdisa ew kesê, ku  
gogê davêje kare bazde here ber qûçê û paşte  
vegere ciyê xwe.Lê diyadagê ji,zû bîke û go-  
gê bigre an ji hevalên wi,bî lez gogê bavêji  
ne wi,ew ji lî wi kesi xe,disa bera diyada-  
gê listikê qezenc dike.Ci tê guhartin. Her



kesê ku ji bo gogê ketîne dorê, careki bi te-  
nê mafê wan ê gog avêtinê heye. Ger carekê go-  
gê bavêje, lî qûça qafikan nexe û nîkarîbe he-  
re hînda qafikan û paşde bizivire ciyê xwe,  
mafê gogê û avêtinê wenda dîke. İcar kesê, ku  
lî dû wi dî dorê de ye, mafê xwe yê gog avêti-  
nê bikartine. Çaxa ku yê duduya qafikan bixe  
dîvê herdu bî hev re bazbidin heta hînda qa-  
fikan û paşve vegeerin diyâdagê ji gogê lî  
herduyan lî kê xe ji listik taw e.

## Çekirin zor e le xırakırın hesa ye

Du çelên kevroska dı nav erdê niska da  
lî benda diya xwe bûn. Diya wan çaxa jî malê  
dabû rê, baş temi lî wan kırıbû tev nelivin..  
Lê belê dı pey çûyuna diya wan bî demekê ni-  
hêrin ku çend pale, dı dest wan de qirimên  
wan û dest bî çinina niska kırın.

Berek du ber çinîn û lî hev cîviyan dest  
bî şêwrê kırın. Yeki jî wan got;  
"Jî vîr heta wîr emê bîçinîn."

E duduya got;

"Na jî vîr heta wîr emê iro bîqedinîn."

E sisîya got;

"Na lo, emê iro gîsi bîqedinîn."

Gîşa bî hev re gotin;

"Erê eme iro gîsi bîçinîn."

Dema ku pale dîpeyîvin, kevroskan li wan  
guhdari dikir û dı pey vê bîryara paleyan re  
kevrosk herdû bî lez çûn ba diya xwe û go-  
tin;

"Dayê vane pale hatîne niska dicinîn û  
nêzikiyê lî me dikin, ka beri ku ew bîghijin  
me, em bîrevin."

Diya wan got;

"Na ew nîkarîn iro vi erdi gîsi bîçî-

nin."

Bû sibe cardîn pale hatîn çînînê.Her ye-  
ki du qırım lî bakırın û lî hev cîviyan.Gîşa  
bî hevra gotin;

"Çiye em hêdi,hêdi pê ketîne were em iro  
vi erdi gîsi bîqedinin.Yeki got;

"Em jî vir dest pê bikin."

Yê dîn got;

"Na em jî vir dest pê bikin."

Werhasîl lî hev nekîrin û jî hevra gotin  
de ka em sibê werin bîqedinin.

Kevroşk cardîn tîrsîyan û bazdan ba diya  
xwe.Gotin;

"Dayê,pala bîryar dan ku wê vi erdi sibê  
bîqadinin,ka em jî xwe re bîrevin."

Diya kevroska got;

"Metîrsin,ew dîbêjîn lê belê nîkarîn bî-  
qedinîn,ez bî wan zanîm."

Kevroşk vege riyan ciyê xwe.Bû sibeti-  
rê cardîn pale hatîn,lî hev kom bûn,û yekî  
go;em jî vir dest pê bikin,yê dîn go,ka em i  
ro gîsi bîçinîn.Kîrin nekîrin bî tu awayî lî  
hev nekîrin.Pâşê jî hev re gotin ev erda bî  
çînîn qet naqede û em tu carî ji nîkarîn bî  
qedinîn.A baş ew e ku em agîr berdinê,bîşewî  
tinîn û xwe jê xelas bikin.

Gava ku kevroskan van peyvan bîhistin,bî lez  
bazdan ba diya xwe.Dema gihiştin ba diya xwe  
bin lî wan çikiya bû.Bî hilke hîlk dest bî  
axaftinê kîrin.Gotin:

"Dayê vane pale hatîn,dîbêñ em nîkarîn  
bî çînînê vi erdi bîqedinin,a baş ew e ku  
agîr berdinê û bî derhekê xwe jî xelas bikin

Çaxa kevroşkan vêya gotin,diya wan got:

"Rast e ew nikarin bî sebir bicinîn lê  
belê wê karîbin bîşewitînin. Çêkîrin zor e,lê  
xerakîrin pîr hêsa ye.Zû bîkîn em xwe xelas-  
kin."

## ELIK, FATIK U MANGA BELEK

Dûmahika hejmara berê

Ap û amojnek Elik û Fatikê hebûn. Bi tay beti amojna wan qet xêra wan nedixwest. Wê dîdit ku Elik û Fatik baş idara xwe dîkin û dîde-bîrin. Lî mîrê xwe kîr rîk, ku mîrê wê bila bî razyên xwe yê sêwi bine mala xwe. Mîrê wê (A-pê zarokan) ji tu çare û mukûn nedit, çû Elik û Fatik û manga wan a belek ani mala xwe. Her çıqas Elik û Fatikê nedixwestin, lê cardîn ne qayıliya wan pere nekînr.

Amojna wan qet xêr bi zarokan nedikir. Lê disa ji bi şirê manga belek ew xurt û mezîn dibûn. Amojna xêr nexwaz û çavnebar, zarok pan û kîfş kîr ku zarok şirê mangê dixwîn. Jî xwe wê, gava mange dîdot, qet nîkari bû çîl kek şir ji, jê bigre. Ser vê rewşa han Amojnê dekek hazır kîr, ku zarokan jî manga wan bîke

Wê, rojekê xwe lî nexwesiyyê dani. Pêşiyê hînek nanê şikeva (Tirê) pat û kîr bin nîvinê xwe. Paşiyê ket nav nîvinan û got: Ez nexwesim Gava xwe bor dîkir, kırtı kırtta nanê hisk. Wê çaxê wê bi nalin û giri dîgot:

-Wêêê... ev çi nexwesiya gîran bû, ez pê ke - tim. Ez vê carê xîlas nabîm, dîmrîm!

Mîrê wê ji ditîrsiya. Ger jîna wi bîmra, wi yê bi ewqas zarok ve wê perişan bîba. Xeynjî Elik û Fatikê, birrek zaroyêñ wan ji hebun..

Jîna wi qet tiştek nedixwar. "Jî goşt bêtir dîlê min tişteki naxwaze. Vê manga Belek a

han ji xwe tîm sitewre. Me rojekê çilkek şirê wê neditiye; wê şerjê kîn. Bila him zarok bixwan û gumane ez ji çend pari bixwim. Dîve hê rizqê min li vê dînê heye.." digot. Mêrê wê disa bê çare, bîryar da kumangê serjê ke.

Alik û Fatik carek dîn çûn ser afîrê mangê û dest bi giri kîrin. Mange care dîn ji hat zîman û got:

- Çiye, hûn vê carê çîma dîgîrin?
- Wê te serjêkin. Amojîna me dîxwaze û apê me ji razi kîriye. Em dê çi bikin wê çaxê . Ji xwe amojîna me çav lîye ku me ji birçina bikuje... gotin zaroyan bi giri.

Mangê gavek şunda ji wan re got ku:

- Apê xwe re bêjin ku, gava min serjê dîke bilas sêlek xweliya agîr bide bin histuyê min bo ku xwina min neriji erdê. Bi vi awayi ew gava min serjêdikin ez dîpişkim û toza xweliyê dîkeve çavên wan, xwe şas dîkin û dîkevin bêliyê. Hun, wê gavê xwe davêjin ser pişta min û em bi hev re direvin, xwe xelas dîkin... Amojîna we ji hema bîra bîmre, ger ew bê goşt dîmre.

Zarok yekser çûn ba apê xwe û serjêkîrîna bi vi serti pê dan qebulkîrin û dest bi hazîriyê kîrin. Dû re manga anin bo ku serjê kin. Gava apê Alik û Fatikê kîra xwe derxist ku bavêje

Dûmahîk heye

## GELO HUN VAN TIŞTAN DINASIN ?

Geli hevalan,  
Lî jêr hîn wêne hene. Ü lî bîn me navê wan  
nîvisiye. Lê hînek tip kêm hatîne nîvisin.  
Gelo hun dîkarîn lî gor wênan ciyên vala  
dagırın.



K E V . O Ş K




D E . T E .



C E . T E



M I . İ . K



P I . T U K



R O . İ



K U . İ K

www.arsivakurdi.org

ISSN: 0280-0241



---

HÊVÎ: Kovara Kurdi ya zarokan / Kurdish children magazine / Kurdisk barn tidning \* ADRESS / NAVNİŞAN: Hêvi; BOX 5034 163 05 Spånga-SWEDEN. \* PRIS / BÜHA: 5 Kronor. \* SUBSCRIPTION / ABONE: 40 Kronor per år. 20 kr. per 6 månader. \* POSTGİRO: 439 33 42-3